Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1223 | 20-Mijdar-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Mala Dengbêjiyê stargeha parastina çanda Kobanê ye



**Ji bo parastin, zindîkirin û pêşxistina çand û hunera civaka Kobanê, Mala Dengbêjiyê hat avakirin û di nava xwe de amûr û alavên çanda Kobanê ya dewlemend jî dihewîne.**

Tişta ku mirovan ango civakan weke hebûn dide der çanda wan e lewre mirov dikare çandê weke ruh û hebûna civakan pênase bike. Çand tiştên madî û manewî ku mirovan afirandiye û civakan ji hev cuda dike di nava xwe de bawerî, cil û berg, ziman, xwarin û vexwarin, kevneşopî, rêbazên jiyanê, huner, feraset û hwd. di nava dihewîne. Li Rojavayê Kurdistanê ku di nava şoreşeke çandî û civakî de ye, navendên Hîlala Zêrîn, TEV-ÇAND û Desteya Çandê rol û erka parastin û pêşxistina çandên li herêmê girtine ser xwe.

Navenda Çand û Hunera Baqî Xido ya Kobanê û desteya Çandê di 3'ê Hezîranê de projeya çand û hunerî ya bi navê Mala Dengbêjiyê vekir. Ev mal piştî amadekariyên 6 mehan, bi merasîmek deriyên xwe ji bo gel re vekir. Bajarê Kobanê ku niştecihên wê Kurdên resen in, ji aliyê çand û hunera xwe ve xwedî mîrateyeke dewlemend e.

Dema mirov serdana Mala Dengbêjiyê dike, vê dewlemendiyê di amûr, şûnwar û çanda ku tê de bi rengekî eşkere berz dibe, xuya dike. Di destpêkê de avahiya malê ku ji 3 odeyan pêk tê, bi axê hatiye sazkirin. Di hundir de xaliyên hatine rêxistin ên bi destên jinan hatin hûnandin in. Her wiha bi dehan parçeyên kevnar ku di devoka Kobanê de weke text û tîr, nemazlix, fanûs, papor, kevçî, tencik, kase, tas, temsî, kûp, def, tembûr, mekut, hesk, kildank, telîs, tifing û hwd. tên bilêvkirin hene. Bi wateyeke din, mirov tabloyeke ji çanda Kobanê ya resen dibîne.

**'Me tabloyek ji çanda Kobanê ya dewlemend ava kir'**

Endama Navenda Çand û Hunera Baqî Xido stranbêj Mehbûba Eto diyar kir ku Mala Dengbêjiyê derfeta nûjenkirina çanda herêmê ye û got: "Projeya çêkirina mala dengbêjiyê 6 mehan berdewam kir. Ji bo ku ev mal ji bo jinan, ciwanan û hezkiriyên hunerê bibe dergehek çandî, ev proje hat pêkanîn. Mala dengbêjiyê xwedî taybetmendiyên wisa ye ku bala her kesê dikşîne û dibe tabloyek ji çanda Kobanê ya dewlemend. Heta di avakirina malê de, me tenê axê bi kar anî ku ev yek jî xwe dispêre malên me yên kevnar ku tê zanîn dapîr û bapîrên me ev çand di malên wiha de parastin û bi pêş xistin. Em ê jî bi riya vê projeyê nehêlin ku dengbêjî û çanda me neyê jibîrkirin û her dem di bîra me de zindî bimîne."

**'Her kes berê xwe dide mala çandê'**

Mehbûba Eto bal kişand ser berhevkirinê û tiştên di Mala Dengbêjiyê de û got: "Me herî zêde di berhevkirina amûr û şûnwaran de astengî dît, ji ber tiştên kevnar in û her kes zû bi zû nade, berovajî li gel xwe diparêze û weke mîrateyeke mayînde dihêle. Lewre me beşek kirî û gelek parçe jî ji gundewaran kom kirin. Jixwe her tiştê di vê malê de ji amûrên çêkirina xwarinê, şûnwaran, xaliyan, rê û resmên malê û hwd. kevnar in û xwedî temenek dirêj in. Weke papor, hawan, teşî, tifing, text û tîr, destar, kûpên avê û hwd. Jixwe em hê jî komkirin û zêdekirina van tiştan berdewam bikin. Civaka me ji vê projeyê hez kir û rojane berê xwe dide vê derê da ku ji nêz ve bibînin û nas bikin. Lewre ez dikarim teqez bikim ku ev mal eynika naskirin û nûjenkirina çanda Kobanê ye."

**'Ked û afrîneriya jinan serwer e'**

Herî dawî Mehbûba da zanîn ku reng û naveroka malê xwe dispêre afrînerî û berhemên dayikan û wiha bi dawî kir: "Weke jin me rola xwe di avakirina vê malê de lîst û bi taybetî jî di berhevkirina pêwistiyên wê de. Lewre dema mirov dikeve mala dengbêjiyê yekser wê atmosfera çand, berhem û afrîneriya dayikan hîs dike û dibîne. Jixwe navê malê jî xwe dispêre vê yekê, tê zanîn ku dayikan bi zengilokên xwe di her bûyerê de stran ango dengêjiyê bi pêş xistine. Di kêfxweşî, şînan û li ber dergûşên zarokan her dem cureyên dengbêjiyê nîşandan. Ji bo vê jî vekirina vê malê derfeteke mezin e ji bo nifşên nû ku ji nêz ve vê çandê nas bikin û xwedî lê derkevin. Bi taybetî jî weke jin divê di asta yekem de ew berê xwe bidin vê malê û dengbêjiya dayikê biparêzin."

NÛ JINHA

# Kovara Komîn; xwezanîn bingeha hemû zanînan e

Lîloz Hisên/Qamişlo




**Di bin sîwana Akademiya Zanistên Civakî de, Kovara Komîn dest bi kar û xebatên weşana xwe kir û jimara yekê di 22 Cotmehê de derxist. Armanca Kovara Komîn vekirina qadeke ji bo têghiştin û nîqaşkirikirina dînamîkên veguherîna civakî di aliyê bîrdozî, zanistî û teorîk de ye.**

Kovara Komîn ku di bin sîwana Akademiya Zanistên Civakî ya Abduulah Oacalan de hatiye amadekirin, bi armanca vekirina qadeke ji bo nîqaşkirin adînamîkên veghirîna civakî di aliyên birdozi, teorî û zanistiyê de hatiye avakirin. Komîn yekemîn hejmara xwe di 22`ê Cotmeha 2024'an de derxist, herwiha kovar her sê mehan carekê deridkeve.

Komîn ji navê wê diyare ku ew kovareke wê li gorî îdealên jiyana komînal, hevgirtin, hilbirîna hevpar û azadiyê ava bûye. Kovara Komîn di nava rûpelên xwe de hêza jiyana komînal, wateya civakbûn û têkoşînê bi hev re, li dijî pêkhateya ferdperset, tecrîtkar û modernîteya kapîtalîst; wê keşf bike.

Kovara Komîn wê bi îlhama ramanên Rêber Abdullah Ocalan ya modela li ser esasê konfedralîzma demokratîk, ekolojik p azadîxwaziya jinê, wê armanc bike di her hejarekê de bi raman û nîqaşên nû vê modelê zêdtir bimeşîne. Herwiha di kovara Komîn de bal hate kişandin ser şoreşa rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku ezmûneke li ser vîna gel û xwerêvebriyê ye.

Komîn ji bo kûrkirina nîqaşan li ser çawaniya avakirina alternatîfa modela şoreşa Rojava, perspektîfekeî teroik û pratîkî deyne, di kovarê de diyar dibe ku mebesta kovarê ne tenê rexnekirine, di heman demê de çareseriyê jî pêşkêş dike. Kovara Komîn lêkoln dike da kubibîne mirov çawa dikare vîna xwe ya xwerêvebriyê di partîkê de bi pîvanên teorîk û pratîk n jiyana komînal bi cih bîne.

Di Kovara Komîn de gelek nivîskar tê de nîqaşên xwe parve dikin, herwiha kovar ji 14 beşan pêk tê, beşê yekemîn ji ramanên Rêber Abdullah Ocalan pêk tê, beşa duyemîn ser heqîqeta Heqîqetê, ya sêyemînjî Jiyana komun a Demokratîk û Ferdê Azad, çaremîn Têgîn û Têgeh, pêncemîn Pîvanên Jiyana Civakî, şeşemîn Avahiyên Civakî Yên Ku Sîstema Dewletê Qebûl nakin, heftemîn Komîn Çiye, heştemîn Bingeha Jiyana Civakî Komîn, nehemîn, tevgerên Komînî, dehemîn çeka Dij Komînê: Ez Eztî, 11emîn Di Hevpeymana Civakî De Rêxistina Komînê, 12emîn Çarçoveya Xebatên Komîn û Komîteyên Wê?, 13emîn Têkiliyê Komînan Bi Rehendên Netewa Demokratîk Divê Çawa Be?, 14emîn Her Tişt Di Jiyanê De Tê Qezenckirin!.

## bi kamîreya ronahî



Şehba

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER ŞERMEZARKIRIN Û RISWAKIRINÊ**

**Bav ji hev çêkirin:**
- Hev êşandin; hev pîs kirin; tiştek nema ku ji hev re negotin; tiştek bi şûn ve nehiştin.

**Bav ji hev re çêkirin:**
- Hev bêminet kirin; gotinên pir giran ji hev re gotin.

**Bêndera li ber bayê heçî hat milhêb dayê:**
- Her kes li ser diaxive. (Dema ji bo kirina tişteke nebaş mirovek dikeve devê civakê, hingê tê gotin)

**Bir pişt kerê:**
- Şermezar kir; rezîl kir.

**Bi xwe de mîz kir:**
- Xwe rezîl kir; xwe şermezar kir.

**Bûye goştê ber didanan:**
- Her kes behsa kiryara wî dike.

**Dawa wî li qûna wî gerand:**
- Rezîl û riswa kir.

**Deqa wî şkand:**
- Rezîl kir; hetikand; şermezar kir; piçûk kir.

**Dûvik pê ve kirin:**
- Navê wî bi nebaşî belav kirin; hetikandin.

Hev birin mala sa (seyan, kûçikan)
- Hev pir pîs kirin; gotinên pir xirab ji hev re gotin; hev pir êşandin.

**Hev xistin dewsa kûçikan:**
- Bi heman wateyê.

**Hilê wî li milê wî kir:**
- Rezîl kir; wisa kir ku êdî nikaribe dengê xwe bike; tiştên wî yên bi dizî eşkere.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 25'ê Mijdarê bû roja vejînkirina hêza jinê




Têkoşîna Xwişkên Mîrabal ên ji aliyê dîktator Rafael Trujillo ve bi awayekî hovane hatin kuştin, heta roja îro jî, ji jinan re dibe mînak. Ev têkoşîna ku weke mîrateyekê ji jinan re ma, li dijî tundiya ku dibe sedema alozî û travmayên civakî îro jî bi her awayî didome.**R-2**

## Rêyên çareseriyê

**Hevserokê Partiya Kesk a Demokrat, Luqman Ehmê da zanîn ku mijara diyaloga bi hikumeta Şamê re têkoşîneke mezin jê re divê. Herwiha Ehmê diyar kir ku di Saykis Pîko de siyaseta Sûriyê û dewletên din hat bicihkirin.R-4**




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1223 | 20-Mijdar-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Şehîd Îsam bi kamîre û pênûsa xwe bû şopdarê rastiyê



Şehîd Îsam Ebdulah şeva 20'ê Mijdara 2022`an de, hemû metirsî li ber çavan girt û ji bo belgekirina sûcên dewleta Tirk a dagirker di bin bombebaraneke dijwar a hewayî de ber bi gundê Teqil Beqil yê girêdayî navçeya Dêrikê ve bi rê ket û di dema belgekirina komkujiya Dêrikê de şehîd bû.**R-6**

## Ji çiraxên hunera kurdî



Hunermend Mihemed Teyîb Tahir stranbêj û nivîskarê Kurd ê ji Rojavayê Kurdistanê ye, kurê gundê Girê Şêra yê girêdayî bajarê Dêrikê, keleha şoreşger û têkoşeran, jêdera helbestvan û hunermendan.**R-7**

# RONAHÎ TV; ÇAVKANIYA ŞOREŞA GELAN

Ronahî TV ku bi zehmetî û derfetên kêm dest pê kir, îro jî çavkaniya rasteqîne ya nûçe û bûyerên herêmê ye. Wê hemû pêvajoyên ku herêm tê re derbas bûn, kêlî bi kêlî belge kir û şopand. Bi saya xebatên wê cîhan ji destkeftî, serkeftin û zehmetiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê agahdar dibe. Ronahî TV bi kamîre û nûçeyên xwe, berxwedana gelên herêmê û hovîtiya dagirkeran ragihand, di heman demê de tu carî pirsgirêkên civakê paşguh nekirin û bû hêviya gelên herêmê.**R-3**



## 'Bi kongreyekê, binesaziyek siyasî ji bo siberoja Sûriyê ava bû'



Fewzî Şingalî da zanîn ku Kongreya Rêya Demokratîk a Sûrî di encama civînên Stokholmê de, weke gewdeyekî siyasî bi armanca çareserkirina kirîza Sûriyê ava bû û got, ji vê kongreyê desteyek bi 21 kesayetên Sûrî ji bo meşandina xebata diplomasî-navnetewî, hat çêkirin.**R-5**

**Jin bi çalakiyan li hemberî tundiyê têdikoşin** — Nehîr pale R-2



**Nema tu kes dikare gelê kurd bixapîne** — Dilyar Cizîrî R-4



**2 meşên dîrokî...** — Farûk Sakik R-5

**Ji bo komkujiya Kurdan wê ji Trump destûr bigirin an na?** — Zeki Bedran R-5

# 25'ê Mijdarê bû roja vejînkirina hêza jinê

Têkoşîna Xwişkên Mîrabal ên ji aliyê dîktator Rafael Trujillo ve bi awayekî hovane hatin kuştin, heta roja îro jî, ji jinan re dibe mînak. Ev têkoşîna ku weke mîrateyekê ji jinan re ma, li dijî tundiya ku dibe sedema alozî û travmayên civakî îro jî bi her awayî didome. Ev têkoşîn di heman demê de li dijî binpêkirina hemû mafên jinê yên weke ked, ziman û nasnameyê ye.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Roja 25'ê Mijdarê Roja Cîhanî ya Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê ye, ev roj bingehê xwe ji têkoşîna xwişkên Mîrabel digire. Patria, Minerva û Maria Teresa li Komara Dominik çalakvanên siyasî bûn û li dijî pergal û siyaseta serokê komarê Rafael Trujillo serî hildabûn û têdikoşiyan. Di 14'ê pûşberê de di dema şahiyê de Rafael Trujillo hewil da ku Minerva yê tacîz bike, loma Minerva helwesta xwe nîşan da û şeqam li Rafael xist. Piştî wê bûyerê bi pêşengiya Minerva ku beşa Parêzerî li zanîngehê dixwend, rêxistina bi navê 'Tevgera 14'ê Pûşberê ava dikin ku navê xwe ji dîroka şeqama Rafael Trujillo xwariye digire û perperîkê jî weke nîşaneya tevgerê hildibijêrin.




Piştî wê bi demekê Rafael Trujillo fermana dîlgirtin û îşkencekirina hersê xwişkan dide û Minervayê ji bawernameya wê mehrûm dike. Paşê hersê xwişk ji girtîgehê derdikevin û di 25'ê Mijdara 1960'î de bi rengekî hov ji aliyê çekdarên Rafael Trujillo ve têne qetilkirin. Ev bûyer dawiyê li pergala Rafael tîne û ew piştî 6 mehan ji qetilkirina xwişkên Mîrebal, tê kuştin. Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî di 17'ê Çile sala 1999'an de biryar didin ku 25'ê Mijdarê, roja qetilkirina xwişkên Mîrebal bibe roja cîhanî ya têkoşîna li dijî tundiya li ser jin û hemû hikûmet, rêxistinên navnetewî, rêxistinên mirovî û yên jin ji bo têkoşîna li dijî tundî û parastina mafên jin rol û misyonên xwe bilîzin.

**Berxwedaniya xwişkên Mîrabal**

Beriya xwişkên Mîrabel û piştî wan jî bi dehan jinên li dijî dîktatoriyan li berxwedane, hebûn. Ji Jeanned Arc bigire heta Fatma Kara, heta Clara Zetkîn, Leyla Qasim, Rose Luxemburg, Sakîne Cansiz û Hevrîn Xelef, têkoşîn û berxwedana jinan mezin dibe. Roja 25'ê Mijdara 1960'an têkoşîna li dijî dîktatoriya faşîst a li Komara Domînîk de bûn sembol û yek ji pêşengên têkoşînê.

Xwişkên Mîrabel ji ber ku li dijî rêveberiya Trujillo têkoşîna mafên mirovan û demokrasiyê li berxwedidan, gelek caran hatin girtin û nêzîkatiyên xirab li hember wan hatin kirin. Destdanîn li ser mal û milkên wan û mehkûmê tunebûnê hatin kirin. Lê belê wan dev ji berxwedana xwe bernedan. Ji ber ku nasnavê yek ji xwişkên Mîrabel "Perperok" bû, her sê xwişk bi navê "Perperok" dihatin bibîranîn. Girtina xwişkên Mîrabel, desteserkirina mal û milkên wan Ji bo dîktatoriyê têr nekir; ji xwe tu zext nikarîn Xwişkên Mîrabel bisekinînin. Her sê xwişkên ku ji serdana girtîgehê vedigeriyan destpêkê destdirêjî li wan hatin kirin û piştre jî hatin kuştin. Cenazeyên her sê xwişkan ji zinarekî hatin avêtin. Çapemeniyê ev yek weke "qezaya trafîkê" ji raya giştî re ragihand. Lê kesî jê bawer nekir. Bandora perperokan li hemû cihanê kir, berxwedan bihêz bû û di dawiyê de dîktatorî hilweşiya. Xwişkên Mîrabel ku di hilweşandina dîktatoriya Komara Domînîk de roleke mezin lîstin û hatin qetilkirin, bûn sembola 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya Li Ser Jinan ya Navneteweyî.

**Roja ku têkoşîn nîşanî jinan da**

Jinên Emerîkaya Latîn û Karayîp, cara yekem di Kongreya xwe de 25'ê Mijdarê îlan kirin. Ji wê dîrokê heta îro wek têkoşîna li dijî tundiyê hatin bibîranîn. Çawa ku 25'ê Mijdarê li herderî di cîhanê de wateya xwe girt, bû rojeke welê ku tund bi tundiya dewletê re bûye yek û nîşan da bê ka têkoşîna jinê çiqasî tiştek pêwîst e. Di heman demê de dîrokeke ku jin bi daxwazên xwe li dijî tundiyê daketin qadan. Neteweyên Yekbûyî (NY) di sala 1999'an de 25'ê Mijdarê bi awayekî fermî nas kir. Ji sala 1999'an û vir ve jin li hemû cîhanê li dijî tundiyê dadikevin qadan.

**Ji ber tundiyê di her 11 xulekan de jinek dimr e**

Di her 11 deqeyan de jinek an jî zarokek keç ji ber tundiya kesên nêzî xwe jiyana xwe ji dest dide. Ji bo jinan cihê herî metirsîdar çar dîwarên wan e ango mala wan e. Di heman demê de hijmarek mezin ji jinên ku tên qetilkirin ji hêla xizmên wan ve ye. Tevî ku 25'ê Mijdarê hatiye ragihandin jî lî dîsa jî jin rastî şidet û qetilkirinê bi awayîn hovame tên.

## Ji Pênûsa Jin

### Jin bi çalakiyan li hemberî tundiyê têdikoşin

Nehîr Pale

Mirov %98 jiyana wî xwezayî ye, civak ne çînî ye û li gel civakê edalet, wekhevî û azadî bi nirxe. Ji ber vê yekê di têkiliya jin û mêr de koletî nîne, yek li ser yê dîtir serwerî nade meşandin, rêz didin hev, ji bo jiyana xwe berdewam bikin bihevre dibin alîkar û bi hevre parve dikin. Ji ber vê yekê jiyan li gel jinê bi wate bû.

Ji buyîna insan 7 milyon heyanî 4000 BZ. di civakê de hebûna jinê heye, zayendeperestî nîne, tûndî li jinê nayê kirin û mafên wê nayên xwarin. Ji bo jinê tê gotin xwedawend, ev pênase aliyê civakî ve birûmete û hebûna jinê heye.

Mêr dema ku weke imperator, qral, pêxember, fermandar, feylesûf, zanyar û serok hat naskirin êdî cî ji jinê re nema û weke fahîşe, cariye û bermalî hat naskirin. Civaka zayîndeperest di bin navê ol û exlaq de destûr nedida ku jin lêkolînên rastiyê bike, pey zanabûnê bikeve û bibe hêza çareseriyê. Jin destpêkê di dema Someriyan de tê şikandin, piştre olên yek xwedayî bi rêbazên herî hişk û gemar nêzî jinê dibin û ew şikandin, herî dawiyê kaptalîzm niha jinê ji hemû aliyan ve bi rêbazên herî kirêt dide bikar anîn û şikand.

Jin 3 caran hatiye şikandin, ango di astekî herî giran de ew xistine. Dîsa jî jin serî netewandiye û dema ku firset dîtiye dest bi şoreşê kiriye. Di dîrokê de hemû şoreş û serhildanên ku çêbûne navê mêran derketiye lê belê jinan jî dest bi şoreşan kiriye. Di şoreş û serhildanên cîhanî de jinan li ber xwe dane û têkoşîn kirine. Jin ji bo avakirin û rizgarkirina welatê xwe şer kirine, ji bo bighîjin mafên xwe yê fêrbûyînê, têkoşînê dikin û niha jî daxwaza avakirina Civaka Demokratîk, Akolojîk û Azadîxwaziya Jinê dikin. Bi vê daxwazê re wê pirsgirêka zayendeperestiya civakî were çareser kirin û hişmendiya mêr were guhertin.

Roja 10`ê Mijdarê Meclîsa Kombûna Jin a Zenûbiya dest bi hemleya têkoşîna li dijî tûndiya li ser jin kirin. Çalakiyên ku ji aliyê jin ve têne birêxistin kirin mêr jî ciyê xwe di van çalakiyan de digrin. Li kantona Dêra Zor û Tebqa mêr ji bo hemleya têkoşîna li dijî tûndiya li ser jinê meşiyan û wê li hemû Kantonên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bimeşin. Her wiha semîner û civînên ku birêxitin dikin jin û mêr bi hevre tevlî dibin.

Tûndiya li ser jinê tê kirin gihîştiye asta ku ziyanê dide nirxên manewî û madî yên civakê. Hinek buyerên tûndiyê ku diqewimin ne ol û ne jî felsefe û zanist berpirsyartiya wê radikin. Ji xwe bi temamî ji exlaq dûrin. Malbat ji bo berpirsyartiya pirsgirêkên xwe ranekin bi rehet zarokên xwe dikin qurban. Bi taybet bav di hemû rewşan de keça xwe dike qurbana pirsgirêkên xwe yên malbatî, ji xwe çi pirsgirêk bi wî re derbikeve wê berê xwe bide hevjîna xwe û tûndiyê lê bike heyanî ku dilê xwe rehet bike. Tu mafî nadin hevjîn û keçên xwe û di pirsgirêkeke biçûk de wan ji xwe re dikin qurban. Ev tûndiya herî mezine li ser jinê tê meşandin.

# Di salên dawî de asta tundiya li dijî jinê bilindtir bûye

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Tundiya li dijî jinan yek ji binpêkirinên mafên mirovan e, lê ji ber ku cîhan li hemberî sûcên li dijî jinan dibin bêdenge her ku diçe tundiya li dijî jinê bi rê û rêbazên cuda girantir dibe. Di deh salên dawî de, di encama şer û pêvçûnên ku rû dane asta kuştin û tundiya li ser jinan bilindtir bûye.**

Di dewletên ku şer û pêvçûn tê de rû didin, bi taybet di Rojhilata Navîn de, di encama şer de, jin di tundiyeke hovane re derbas dibe, li ser kesayeta wê kiryarên dijî mirovî tên pêkanîn, herwiha bê sûc tê kuştin, destdirêjî û istîsmarkirina cinsî li ser tê ferizkirin. Tundiya li dijî jinê diyardeyeke cîhanî ye di nava tevahî civak û çandan de, ne tenê di herêmekê sînordare, lê belê ji ber rewşên şer ev tundî zêdetir dibe û bandoreke taybet li ser jinan dike, ji ber şert û mercên zehmet yê ku jiyan dike û fikarên pîskolojîk û fîzîkî ku li hember wan derdikeve. Tundiya li dijî jinan yek ji binpêkirinên herî berbelav, berdewam û wêranker ên mafên mirovan e di cîhanaê de ye, lê ji ber bêcezakirin û bêdengiya li derdora wê, herî kêm ji nava sê jinan jinek rastî tundiya fîzîkî an zayendî tê. Tundî li dijî jinan di derdorên şer û pevçûnên çekdarî de berbelav e, tevî ku şer û pevçûnên çekdarî bandorek tirsnak li ser hemû sivîlan bi giştî kiriye, lê jin bi awayekî mezin ji vê rewşê bandor bûne, şerên çekdarî bûne sedema êş û azarên sivîlan, giraniya krîza aborî, binesaziya xerabûyî û têkçûna xizmetguzariyan, lê ji bilî vê, jin ji ber normên zayendî yên çandî yên serdest neçar in ku bi tevgerek kêm re rû bi rû bimînin. Di heman demê de, ji ber ku ew ji peydakirina xwarinê û peydakirina lênêrînê di malên xwe de berpirsiyar in, ew neçar bûne ku bi kêşeyên ku bi kêmbûna gihîştina xwarin, av, paqijî, û karûbarên lênihêrîna tenduristiyê re têkildar in re mijûl bibin, ji ber domandina şer û pêvçûnên çekdarî yên di hin welatan de rû dide.



Li Herêma Rojhilata Navîn, nakokî û bêaramî ku li gelek welatên wê belav bûye, şêweyên cudakariyê yên berê yên li dijî jinan zêdetir kiriye, di vê çarçoveyê de şer û pêvçûnên li Yemen, Sûriyê, Lîbya, Îraq, Efxanistan, Îran, Sûdan û Fîlestînê gihaşt astên cuda ji tundiya li dij jinan di nav de kuştina bêserûber, îşkence kirin, girtin, windakirina bi zorê, tundiya zayendî û zewaca bi zorê, hêzên desthilatdar dibin alîkar di bikaranîna tundiya li ser jinê pêk tê, nemaze tundiya zayendî weke şêwayeke hişk ji şêwayên şer, îşkence û zordariya siyasî, ji bo pêkanîna armancên wê yên istratîjîk, da ku şênî dev ji xakên xwe berdin û xak û çavkaniyên xwezayî yên ku ji bo wan şer dikin, kontrol bikin.

**Li gorî raporan rêjeya kuştina jinan di şer û pêvçûnan de ji sedî 40**

Li gorî rêxistina Sam li Yemenê ji destpêka şer û heta dawiya sala 2022'an zêdetirî 5 hezar binpêkirin li dijî jinan hatine belgekirin, di nav de kuştin, revandin, giritin û îşkence kirin, diyar kir ku di vê demê de hezar û 100 jin hatin kuştin.

Ji destpêka şerê Filestînê zêdeyî 6 hezar û 300 jin bi sedema şer hatin kuştin, nemaze sûcên dijmirovî ku li dijî wan pêk tên.

Li Sûriyê ji destpêka şoreşê zêdetirî 29 hezar jin hatin kuştin.

Komîteya Jinê li Îranê zelal kir ku hejmara jinên ku hatin idamkirin ji destpêka sala 2024`an gihaştiye 20 jin. Nemaze sûcên ku derheqê jinan pêk tê di girtîgehan de, ji destpêka şoreşa Jin, Jiyan, Azadî.

Li Tirkiyê qaşo ewlehiyê di welatê xwe de ida dike, ji bo parastina mafên jinan û kuştina jinan bêdenge, li gorî Platforma " Em ê Kuştina Jinan Rawestînin" 295 tawanên kuşrinê û 184 wefata bi guman di 9 mehên yekemîn ji sala 2024`an tomar kir. Di sala 2023`an 315 tawanên kuştinê û 248 wefata bi guman hate tomar kirin. Çalakvanên jin dibînin ku yên dibin sedema van sûcan zihniyeta baviksalarî ye yanî hikumeta Tirkiyeyê ye.

Li Efxansitanê jî ji destpêka ku Talîban dest danî ser welat 2021`an, binpêkirinan dijî jinan pêk tên û ji hemû mafên jiyanî tên mehrûmkirin, nemaze fesrzkirina hîcabê, û herimandina ji mafê xwendinê û kar.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Mihamed Teyîb Tahir Şahê dengbêjiyê û strana kurdî ya resen. Huner û şiyana afirandinê ne diyariyek e ji bo herkesî, belê, ew di jiyana me de bi hin mirovên taybet re sînorkirî ye, ew kes xwedî şiyan in ku bi hunerê dikarin xwe ji xem û derdên xwe xilas bikin, çi bi stran û hem jî bi saz, ew afirandin û hunereke bêhempa ye, hunermend ji çavkaniya civaka xwe vedixwe û hunera wî bi lêdana nebza wê lêdide, êş, kul, şahî, xemgînî û hêviyên xwe yên rizgariya ji bendên koletiyê û nîrê sitemkariyê vedibêje di rêya stranên ku pêşkêşî cîhanê dike û radigihîne bi şêwazên bedewiyê di hunerên stran û muzîkê de. Hunermendên Kurd bi dirêjahiya sedê salan bi stran û peyvên xwe yên watedar beşdarî parastina nirxên neteweya Kurd û parastina nasnameya netewî û çandî ya gelê Kurd bûne, hunermend Mihemed Teyîb Tahir yek ji wan hunermendên Kurd e ku di nava pêncî salan de bi stran û awazên xwe nasnameya çanda Kurdî û hunera Kurdî ya resen parastiye.

Hunermend Mihemed Teyîb Tahir stranbêj, nivîskar û bestekarê Kurd ê ji Rojavayê Kurdistanê ye, kurê gundê Girê Şêra yê girêdayî bajarê Dêrkê, keleha şoreşger û têkoşeran, jêdera helbestvan û hunermendan, ew yek ji pêşengên strana netewî û folklorî ya Kurdî û yek ji navdartirîn hunermendên Kurd û stêrkên dengbêjiya kurdî li Sûriya yê tê hesibandin, wî nêzîkî pêncî salan rêya xwe şopandine di warê hunerê de û li pey xwe mîratek nemirdin ji stranên netewî, folklorî û gelêrî hişte.

Ew yek ji navdartirîn hunermendên Kurd tê hesibandin yên ku derketine di qada huner û muzîka Kurdî de di Rojavyê Kurdistanê de, di encama hesta xwe ya neteweyî ya bilind û dilsoziya xwe ya ji bo pirsgirêkên gelê xwe, navdariyek mezin bi dest xist û di dîroka hunera Kurdî de kedên mezin û şopên zelal wî dane.

Hunermend û bestekarê navdar ê kurd Mihemed Teyîb Tahir di sala 1940'an de li gundê Hilwa Şêx ji dê û bavekî kurd (Sofî Taher û Eyşe) hatiye dinya yê, ew di malbateke kurdperwer a welatparêz de, ku ji huner û çanda kurdî hez dikir, ji şeş zarokan (sê kur û sê keçan) pêk dihat, mezin bûye û di nav birayên xwe de yê herî biçûk bû, piştî wê malbata wî koçî gundê Hedadê bû û demekê li wir man û piştre di destpêka salên pêncî yên sedsala borî de koçî gundê Til Xenzîrê banî (Girê Şêra) bûn û êdî li wir bi cih bûn.

Hunermend Mihamed Tayîb zarokatiya xwe li ser xaka gundê Tel Xenzîrê banî (Girê Şêra), li ser banê girê wî yê bi heybet, di hembêza zeviyên rez, darên hêjîran û baxçeyên wê yên bedew de, li qiraxa Gula Elîyê Miro, li kêleka aşê Ebû Semîr, di nav sêlaka Girkê Seyranê û newala Ebdo etar de borande.

Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ya ji bo stran, mûzîka kurdî û wênekêşiyê di temenekî biçûk de dest pê kiriye, di deh saliya xwe de, di bin bandora bavê xwe de ku bilûrvan bû û birayê wî yê ku helbestên olî digotin, roleke wan ya sereke hebû di jiyana wî ya hunerî de.

Dibistana seretayî li gundê Hedadê xwend, piştî wê malbata wî ji ber hin sedem û babetên curbicur koçî gundê Girê Şêra bû û ji ber şert û mercên zehmet ên jiyanê, evîn û hezkirina xwe ya ji bo muzîka kurdî û stranbêjiyê, xwendina xwe ya navîn neqedand, ji lewra hîn di destpêka ciwaniya xwe de di karên zehmet de dixebitî.

Wî di sala 1963'an de dest bi karê xwe yê hunerî bi sitran û dengbêjiyê kiriye di helkeftên netewî û şahiyên herêmî de , di wê demê de wî strana xwe ya yekem (Bûkê Delalê) tomar kir, ku ji aliyê wî ve hatiye çêkirin û ji aliyê yek ji zilamê gund (Mihemed Ehmed) ve hatiye nivîsandin, paşê, di sala 1968'an de, çû paytexta Lubnanê, Beyrûtê, û li wir li Enstîtuya (Amûjgeha) Hunerên Bedew xwende û bi komek hunermendên Kurd re Koma "Eriz" ya Hunerên Gelêrî damezrandin û tê de şano û konsertên Kurdî û Erebî pêşkêş kirin, di wê demê de heval û hevjîna xwe ya jiyanê nas kir û zewicîn û çar zarokên (sê kur û keçek) ji wan re çêbûn. Di sala 1970'ê de li gel hunermend Xanim Sîno koçî herêma Kurdistanê dike û di stûdyoyên radyoya kurdî de çend stranên neteweperwerî, folklorî û evîndarî tomar dikin û di radyoya kurdî de hatin weşandin û di wê demê de bi stranên xwe yên hêja navdar bû wek:


1-Bûkê Delalê
2-Dêrsim
3-Çiyayî yê .
4-Hey Canê Semîra .

Di sala 1970'an de bi helkefta 11'ê Adarê bi amadebûna berpirsê navçeyê Îsa Siwar beşdarî konsera yekem a Zaxoyê dibe û di sala 1972'an de li Dihokê Koma Folklorê ya Dilman damezrand. Di sala 1974'an de kom bi amadebûna wezîrê dewletê yê wê demê beşdarî Festîvala Hunerî ya Kurdî li Bexdayê bû, Kom ji nav 14 komên hunerî hat hilbijartin û di nav wan de xelata yekem wergirt. Paşê di heman salê de ligel muzîkjen Ezedîn Temo di Şoreşa Îlonê de tevlî refên Pêşmergeyan dibe û di nava refên Pêşmergeyan de komek hunerî ava dike.

Piştî têkçûna Şoreşa Eylûlê di sala 1975'an de, ew diçe Îranê û ji ber ku konsertên neteweyî û Pêşandanên şanoyê pêşkêş dike, li wir ji aliyê desthilatdarên melayên Îranê ve tê girtin û çend mehan tavêjin zindanê de û piştre wî sirgûnê Sûriya yê dikin.

Piştî wê dîsa careke din vedigere Beyrûtê û Rojava, jiyana xwe derbas dike di navbera çûn û koçkirinê de, geh dûrketin, geh jê guhistin, herwiha revyayî dima ji ber dozgeriya ewlehiyê .

Ji ber stranên xwe yên netewî, di sala 1976'ê de ji aliyê desthilata Bais a Sûriyê ve tê girtin û piştî şeş mehan di zindanê de dimîne, di 24'ê Cotmeha sala 1976'an de koçberî Herêma Kurdistanê dibe û heta sala 1979'an li wir dimîne, ew li wir jî ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Iraqê ve tê girtin û mişextê Bexdayê tê kirin, piştre ew neçar dimîne ku vegere Rojava û piştre jî Lubnanê, ji wir jî di sala 1979'an de berê xwe dide Ewropayê û li Elmanyayê bi cih dibe. Di sala 1993'an de, ji Almanya diçe Îsraîlê li ser vexwendina civaka Kurd û li wir çend konsertên hunerî û şevbuhêrkên stranbêjiyê li dar dixe, lewra ji wê demê ve desthilatên ewlekariya Sûriyê nehiştin ku ew derbasî nav axa Sûriyê bibe. Di sala 2005'an de vedigere Herêma Kurdistanê û gelek konsertên hunerî û şevbuhêrkên stranbêjiyê pêşkêş dike, ji stranên wî yên herî navdar:



1-Ez Xerîbim
2- Hej te dikim gula geş
3- Ezîza
4-Mûsila rengîn
5-Zindan
6-Buhar Borî.
7-Wa cîranê
8-Elo û Fatimê
9-Were Lawiko
10-Nazoka min
11-Ey Felek
12-Leyla Qasim
13- Wa Cîhanê.
14- Bê Sozê
15-Wer Helîma
16-Şev û Roj
17-Dêrsim
18- Kîne Ew
19-Çiyayê yê
20-Barzanî, Pêhlewanê Kurd
21- Mehabad Giriye
22-Te Ez Helandim
23-Bûkê Delalê
24-Hey Canê Samîra
25-Dema Tu Ber Min re Borî (Kezî Zerê)
26-Rihanîka Rahan Candin.

Wî heşt albomên stranbêjiyê û çend kasêtên stranan di şahiyên mîna: (Dihok, Zaxo, Mûsil, Bexda, Beyrût, Îran, Almanya) de derxistine:

1-Alboma Zaxo sala 1970 - Dilber
2-Alboma Bexda- sala 1974'an
3- Alboma Îranê sala 1975'an
4-Alboma Dihokê sala 1978'an
5- Albom Elo û Fatimê - Zaxo 1978'an
6-Alboma Zaxo - 1977'an
7-Alboma Berlînê 1980'an
8-Alboma Berlînê sala 1982'an..

Li gel çend hunermend û stranbêjên Kurd, wek (Gulbuhar, Îdrîs Zaxoyî, Seîd Yûsif, Mehmûd Ezîz Şakir... hwd.) stranên cotikbêj (duet)û bi komên stranbêjan re stran gotine.

Hunermend û stranbêjê navdar ê Kurd Mihemed Teyîb Tahir yek ji stûnên hunera Kurdî û muzîka resen a Kurdî tê dîtin, ji ber ku wî stranên gelêrî û serûliyên kevneşopî lê zêde kirine, îro ew bi serê xwe dibistanek tê hesibandin, ew ji hunermendên din cuda bû, ji ber ku hemû stranên wî ji aliyê wî ve hatine çêkirin û muzîka wî li ser bingeha komên mûzîkê hatine parvekirin, evro xelkê Kurdistanê û cîhanê stranên wî dibêjin.

Hunermendê hêja Mihemed Teyîb Taher di 16'ê Tebaxa 2016'an de li bajarê Bon yê Almanyayê li welatê xerîbiyê, dûrî malbat, xizm û warê xwe koça dawî kir û termê wî yê pak li goristaneke bajarê Bonê hate veşartin, dûrî axa Kurdistanê, ku wî jê hez dikir û jê re stran digotin, piştî xebateke hunerî ya dirêj ku zêdetirî pêncî salan dom kir, wî mîraseke hunerî ya dewlemend li pey xwe hişt ku bi stranên xwe yên neteweyî, folklorî û dildarî pirtûkxaneya hunerî ya kurdî dewlemend kir, ku ji zêdetirî dused stranan ji gelê xwe yê Kurd re li ser evîn, eşq û welat hiştine û piraniya stranên wî jî awaz û gotinên wî bûn, stranên wî dengvedaneke berfireh di nav gelê Kurd de li Sûriyê û herwiha li herêma Kurdistanê û li welatên Ewropa û cîhanê de deng vedan.

Gelek hunermendên kurd stranên wî gotine, wek (Hemê Ebû Zêd - Hesen Şerîf - Îdrîs Zaxoyî, Berekat Heso û gelek hunermendên din), heya niha jî stranên wî ji aliyê gelek hunermendên kurd ve di dawet, aheng û şahiyan de tên gotin. Ji ruhê wî yê pak re, rûmet û mandarî û ji bo mîrateya wî ya têkoşînî û hunerî, mayînde û berdewamî.

# Şehîd Îsam bi kamîre û pênûsa xwe bû şopdarê rastiyê

Şehîd Îsam Ebdulah şeva 20'ê Mijdara 2022`an de, hemû metirsî li ber çavan girt û ji bo belgekirina sûcên dewleta Tirk a dagirker di bin bombebaraneke dijwar a hewayî de ber bi gundê Teqil Beqil yê girêdayî navçeya Dêrikê ve bi rê ket û di dema belgekirina komkujiya Dêrikê de şehîd bû.

**Dîlan Mulhim/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker 20'ê Mijdara 2022`yan de gundê Teqil Beqil ê girêdayî Dêrikê bombebaran kir. Dema ku welatî ber bi cihê bombebaranê ve diçûn da ku birîndaran rizgar bikin, dewleta dagirker careke din welatî bombebaran kirin û komkujiyek pêk anî. Di encamê de nûçegihanê ajansa Hewarê (ANHA) Îsam Ebdulah jî di nav de 11 welatî şehîd bûn. Di derbarê duyemîn salvegera Şehîd Îsam Ebdulah de hevalê wî yên rojnamevan, Rênas Remo ji rojnameya me re axivî.



### Jiyan û xebata wî ya şoreşgerî

Rênas Remo girêdayî jiyan û xebata şehîd Îsam wiha anî li ser ziman: "Şehîd Îsam ji malbateke welatparêz bû û di salên 80' î de malbata Şehîd Îsam Tevgera Azadiya Kurd naskir. Şehîd Îsam ji zaroktiya xwe de partî naskirin, di wê demê de şehîd Îsam li ser wî fikirê Tevgera Azadiya Kurdistanê mezin bû.Herwiha di destpêka şoreşa Rojava de şehîd Îsam weke ciwanekî kurd di nava vê şoreşê de cihê xwe girt, di destpêkê de li bajarê Rimêlanê bikarê konfidrasyona xwendekarên kurd rabû, piştire şehîd Îsam di sala 2013'an de cihê xwe di Rojnameya Ronahî de girt. Şehîd Îsam di aliyê karê xwe de kesekî welatparêz bû, ji karê xwe gelekî hezdikir û ew karê ku dikir weke erk li ser milê xwe didît. Herwiha Şehîd Îsam bi şev û roj karê xwe dewam dikir, di heman demê de bi mihan li dergeha sêmalka, dema ku êrîş li herêmê çêbibûn û kar û xebatên civakî yê bajarê Dêrikê dişopanid."

### Hevaltiya Şehîd Îsam Ebdulah

Rênas di derbarê hevaltiya xwe ya bi şehîd Îsam re wiha got: "Di sala 2015`an de li bajarê Rimêlanê ku di qada Ragihandinê de naskirina min bi şehîd Îsam re çêbû, di wê demê de hevaltiya me destpêkir. Piştire Şehîd Îsam di sala 2018' an de tevlî karê Ajansa Hewarê (ANHA) bû, herwiha dema şehîd Îsam tevlî karê ajansê bû hevaltiya me xurtirbû, ji ber ku ez nûçegihanê ajansa Hawarê ya bajarê Tirbespiyê bûm û şehîd Îsam nûçegihanê ajansê yê bajarê Dêrikê bû. Ji ber vê yekê têkiliyên me bihevre bi hêztir bû, di heman demê de hevaltiyek rast û dirust bû, heta roja îro jî min hevaltiya şehîd Îsam ji xwe re kiriye roniya jiyana xwe."

### Şehîd Îsam bû pêşengê qada Ragihandinê

Rênas di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Dema ku Şehîd Îsam dest bi karê rojnamevaniyê kir, ew kar ji bo wî qadeke nû bû, ji bo ku di karê xwe de serkeftî bibe hin rêgez pêwîstbûn, mîna dilsozî, xwestek, vîn û ked, ev jî taybetmendiyên şehîd Îsam bi xwe bû. Lewma di demeke kurt de fêrî kar bû, herwiha bû sozdarê pêşengên qada rojnamevaniya azad. Her dem ew li cihê pêwîst bû û rastî radigihand. Bi heval û derdora xwe re jî dilsoz bû, ji wan fêr dibû û ew fêr dikirin."

# Her roj bikin roja aştiya zarokan

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**20'ê Mijdarê wekî Roja Mafên Zarokan a Cîhanî tê pîrozkirin, lê pêwîste parastina zarokan di rojekê de sînordar nemîn e, her roj bibe roja zarokan, ji ber heya niha li cîhanê zarok ji maf û parastina xwe ya jiyanî bêpar e.**

Di sala 1917'an de maf û neheqiyên ku li zarokan tên kirin, bû rojevek sereke di nava civakê de. Ji bo ku ev pirsgirêk bên çareserkirin gelek kes bertek û nêrînên xwe bi riya medyaya civakî parve kirin û daxwaz kirin ku rojek wekî roja mafên zarokan were destnîşankirin. Li ser daxwaz û pêşniyariyên civakê, di sala 1925'an de li Cenevreyê konferansa di bin navê xweşguzarî ya zarokan de hat lidar xistin. Di vê konferansê de pêşniyar hate kirin ku 20'ê Mijdarê wekî Roja Mafê Zarokan A Cîhanî were diyarkirin. Piştî 64 salan şûnde, di sala 1989'an de pêşniyariya mafê zarokan ji milê Neteweyên Yekbûyî ve, bi awayek fermî hate pejirandin. Di heman demê de roja "Mafê Zarokan" ji aliyê 193 dewlet-neteweyan ve hate pejirandin. Emerîka û Somalî tevlî vê hevpeymanê nabin. Lê di sala 1990'î de Emerîka û di sala 2015'an de Somalî jî, vê hevpeymanê mohr dikin. Bi vê şêweyê hevpeymana mafên zarokan ji aliyê 195 dewlet-neteweyan ve tê mohrkirin.

### Her zarok xwedî heman maf e

Di hevpeymanê de 54 xalên sereke ji bo mafên zarokan hatine destnîşankirin. Hinek ji wan xalan mirov dikare wiha rêz bike: Temenê zaroktiyê ji 0/heya 18 saliyê ye. Kesên di bin temenê 18 de doz li wan nayê vekirin û nabe ku bikevin girtîgehan. Bi tu şêweyî niheqî û xirabî nabe ku li zarokan were kirin. Kesên di bin temenê 18 de nabe ku beşdarî şeran bibin û neheqiyên cûda li wan werin kirin. Herwiha nabe cûdahiya ol, ziman, çand, zayend, nijad û hwd… din li zarokan bê kirin. Bêyî ku cûdahî bikeve navbera zarokan, her zarok xwedî heman maf û civake. Ji van 195 dewletên ku hevpeyman mohir kirine, di ber parastina mafên zarokan de berpirsyar in. Hemû dewletên ku hevpeyman mohr kirine li gorî 54 xalên hevpeymanê di zagonsaziya xwe de gurherîn dane çêkirin. Ji bo şopandin û pêkanîna vê hevpeymanê komîteyek çavdêriyê ji aliyê NY'ê ve hate avakirin û erka vê komîteyê ew e ku her 5 salan carekê rewşa zarokên li 195 dewletan dijîn, di ber çavan re derbas bike û derbarê van dewletan de rapora çavdêriyê amede dike û dide Neteweyên Yekbûyî.

### Di asta cîhanî de "Rojên cîhanî yên zarokan"

Di asta cîhanî de çend rojên cûda yên ji bo zarokan hatine diyar kirin. Yek jê jî 1'ê Hezîranê ye ku li gelek welatên cîhanê wek roja zarokan tê pejirandin û li Herêma Kurdistanê jî gelek rêxistin û saziyên taybet ên zarokan hene ku ji bo bidestanîna mafên zarokan kar dikin. Di heman demê de, di sala 1925'ê de, di konferansekî cîhanî ya ji bo parastina mafên zarokan de roja 1'ê Hezîranê wek Roja Cîhanî Ya Zarokan hate destnîşan kirin û bi fermî jî di sala 1950'î ve li gelek welatên cîhanê 1'ê Hezîranê bû roja cîhanî ya zarokan. Derveyî wê jî li çend welatan di meha Adar, Nîsan û Gulanê de ew roj wek roja cîhanî ya zarokan tê qebûl kirin. Derveyî wê Rêxistina Netewên Yekbûyî sala 1954'an de 30'ê Nîsanê ji bo teşwîqkirina welatan a têgeheştina zêdetir a derbarê zarokan û xweş jiyan, wek rojekî taybet diyar kirin. Herwiha federasyona Demokratîk a Navnetewî ya Jinên Yekitiya Sovyetê jî roja 20'ê Mijdarê wek roja cejna zarokan diyar kiribû.

### Zarok ji êrişan re dibin qurbanî

Dewletên ku hevpeymana mafên zarokan mohr kiribûn û qaşo xwedî li mafên zarokan derdikevin gelek caran neheqî li zarokan tê kirin. Li gorî lêkolîn û zaniyariyên ku hene gelek dewlet mafên zarokan binpê dikin. Her çendî hevpeymana mafên zarokan ji milê gelek dewletan ve hatibe pejirandin jî, lê belê bi tu awayî mafên zarokan nîn e û hebûna zarokan nayê parastin. Li Rojhilata Navîn ji ber sedemên şeran her roj bi dehan zarok tên kuştin an jî parçeyek ji bedena wan diçe. Ev bûyer û geşedan hemû li ber çavên Neteweyên Yekbûyî çêdibin. Lê hêzên navdewletî li dijî van neheqiyên ku li zarokan tê kirin, bertek nadin nîşandan. Ji sala 2013'dan û şûnde şer û pevçûn li axa Sûriyê gur bûn û kesên herî zêde para xwe ya neyînî ji van şeran girtin, zarok bûn. Bi sedema van kirîzan jî koçberî pêk hat, di koçberiyê de jî, gelek zarokan jiyana xwe ji dest dan an jî bê dê û bav man. Di heman demê de di her koçberiyê de zarok ji serma, germa, bêvaî û xwarinê jiyana xwe ji dest didin. Ji bilî van binpêkirinan gelek



zarok li welatên cûdan ku temenên wan di navbera 0-6 salî de yên bi dayikên xwe re li girtîgehan dimînin.

### Zarok di nava qirkirinên polîtîkeyên cûda de dijîn

Li cîhanê hîna bi milyonan zarok ji îmkanê perwerdebûnê bêpar in, di mercên karê giran de tên eciqandin, di nav malbatê de ziyan li wan kirin. Hîn bi zaroktî ji nexweşîyên cûrbecûr û yan jî di şeran de dimrin an tên kuştin. Ji ber şer mafê jiyanê yê zarokan ji dest tê girtin. Li Bakurê Kurdistanê jî bi hezaran zarok di temenê xwe yê piçûk de di nav kar û xebatê de ne. Ji dewletên ku hevpeyman mohir kirine yek ji wan jî dewleta Tirkiyeyê ye. Her çendî di sala 1990'î de hevpeyman ji milê dewleta Tirk ve hatibe mohrkirin jî, lê belê nehatiye pejirandin. Di sala 1995'an de hevpeyman ji milê dewleta Tirk ve tê pejirandin. Lê kiriyarên ku niha ji milê dewleta Tirk ve li Bakurê Kurdistan û Bakur Rojhilatê Sûriyê û Rojava tên meşandin kiryarên derveyî mirovahiyê ne. Pirsgirêka herî mezin ew e ku polîtîkayeke berfireh û bi bandor a mafê zarokan tune ye.

### Zarok ji hêviyên xwe yên jiyanî bêparin

Zarok berhema mirov, ya berhimandin û berdewamiya malbat û civakê ye. Pêwîstîya anîna zarokan li gorî lênerîn, daxwaz û pêwîstîya malbatê û civakê tê guhertin. Rewş û mercên zarok tê de mezin dibin yên aborî, malbatî û civakî, li ser psîkolojîya zarok bandorek mezin dike. Piranî zarok di rewşek xerab û bi pirsgirêkan mezin dibin. Heta di gelek civakan de ji bo ku nikarin zarokên xwe xwedî bikin, hîn bi zaroktî wan di karên giran û ji qeweta wan zêdetir dixebitînin, ev yek jî dihêle ku zarok ji hêviyên xwe yên jiyanî bêpar bimînin.

### Zarok siberoja welat û hêviya gelan e

Pêwîste parastina zarokan di rojekê de sînordar nemîn e, her roj bibe roja zarokan û berpirsyarên mafê zarokan bi erkên xwe rabin û li dijî kiryar û tundiya li ser zarokan dengê heqiyê derxînin. Herwiha ji bo zarokan pêwîste cîhaneke biewle û hêvî were avakirin, ji ber cîhan ku rojane zarok lê tê kuştin ew ne cîhane, an destê ku destdirêjiyê li ser zarokan dike ne destê mirove, lawirê hov ji zarokên xwere dibe parastin û hêvî, lê çima mirovê ku wijdanê wî heye, ji zarokan re nabe hêvî. Zarokan biparêzin, ji ber zarok siberoja welat û hêviya gelan e.



# Çavkaniya resen a Şoreşa Rojavayê Kurdistanê "Ronahî TV"

Xebatkar û pêşkêşvanên Ronahî TV Newroz Demhat û Cûdî Elî dan xuyakirin ku asta Ragihandina Kurdî ezmûnek ava kiriye û di heman demê de bibîrxistin ku Ronahî TV di perwerdekirina civakê de, rişteke mezin girtiye ser mile xwe.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Di 21'ê Mijdara 2011'an de, Ronahî TV li Ewropayê hat avakirin û dest bi weşanê kir. Lê bi taybetî Qamişlo, Kobanê û Efrînê jî xebatên Ronahî TV hatin meşandin. Piştî demeke weşana test, dest bi weşana xwe ya fermî kir û cara pêşîn tenê 3 demijmêran dest bi weşanê hat kirin. Di wan 3 demijmêran de jî, nûçe bi zimanê Erebî û Kurdî hatin weşandin. Di salvegera xwe ya sala 2'yem de, Ronahî TV weşana xwe kir 24 demijmêr.

Ronahî TV nûçeyên xwe bi van zimanan pêşkêş kirin: Her du zaravayên Kurdî (Kurmancî û Soranî), zimanê Erebî, Îngilîzî û Fransî. Piştî 2017'an hemû navendên xebatên xwe derbasî Rojavayê Kurdistanê kirin. Kanalê piştî derbasî Rojava bû, ji taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo dest bi weşana xwe kir. Piştî pêngavên rizgarkirinên ji DAIŞ'ê, bajarên weke Minbic, Tebqa, Reqa û Dêrezorê jî navend û ofîsên xwe vekirin. Her wiha Ronahî TV di sala 2021'an de stûdyoya xwe ya Hesekê vekir û heya roja îro weşana xwe li wê derê didomîne. Piştî vê yekê bi taybetî karî weşangeriyeke aktuel û zindî bi rêve bibe. Nûçegihan û pêşkêşvanên Ronahî TV ji bona ku êrîşên li ser herêmê tên meşandin ragihîne û kiryaran ji bona raya giştî işkere bike rîstek mezin da pêşîya xwe. Di salvegera Ronahî TV ya 13'mîn de jî, bi pêşxistina asta bernameyên xwe bû dengê Kurdistanê û Rojhilata Navîn.

Bi boneya salvegera avakirina Ronahî TV û di derheqên xebatên televizyonê de, pêşkêşvan û xebatkarên Ronahî TV Newroz Demhat û Cûdî Elî ji rojnameya me re axivîn.

### 'Ronahî TV şopdarê rêya Gurbetelî Ersoz û Xelîl Dax e.'

Rojnamevan û pêşkêşvana bernameyên jin û nûçeyan ya Ronahî TV Newroz Demhat ragihand ku beriya Ronahî Tv jî xebatên ragihandinê dihat meşandin û piştî şoreşa Rojavayê Kurdistanê ev gihişte astekê mezin û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Beriya Ronahî TV jî, gelek televizyon û dezgehên çapemeniya azad hebûn, mîna Med TV, Roj TV, Nûçe TV hwd. Lê avakirina Ronahî TV pir girîng û watedar bû. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê wek hemû aliyên xebatê pêşketin avakir, di heman demê de ji milê xebatên Ragihandina Azad ve jî, pêşketin dan avakirin. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bû şoreşa jinê, şoreşa çandê, şoreşa ragihandinê û di heman demê de bû dengê şoreşa Rojavayê Kurdistan ê. Ronahî TV di gelek qadan de xebatên cur bi cur da meşandin. Ronahî TV şahidîya gelek bûyerên ku di şoreşê de hatin jiyankirin raxiste berçavan. Ev encama xebatên salan yên endam û xebatkarên Ronahî TV ye. Rastiya ku di heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dihat jiyan kirin bi awayekî resen gihande cîhanê. Bi derfet û hejmareke ji endamên xwe di roja îro de gihandiye bi milyonan. Ronahî TV dengê rastî û gelên bindest yê Rojhilata Navîn e. Ronahî Tv mîrateya Gurbetelî Ersoz, Musa Enter û Xelîl Dax e. Di



Newroz Demhat

heman demê de, gelek xebatkarên Ragihandina Azad yên Rojavayê Kurdistanê weke Seyid Evran, Dilîşan Ibîş hwd. Pakrewanên bi riya serxistina çapemenî û ragihandina azad yên ku canê xwe feda kirin e."

### 'Xwe gihandina asta ku em bibin dengê civakê ne hêsan bû'

Newroz derheqê bername û plansaziyên Ronahî TV de agahî dan û axaftina xwe wiha qedand: "Ronahî TV gelek astengî û zextan rû bi rû ma. Lê vîn û hişmendiya ku xebatkarên televizyonê li ser hatin perwerdekirin ev astengî derbaskirin. Ji ber ku bê derfetî di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de û bê ezmûnî di qada ragihandinê de dihate jiyankirin. Ev astengî derbas kirin, zêde ne hêsan bû. Lê vîn û ramanên Rêber Apo dibû çavkaniya coş û kelecana kar û xebatên me û li gorî vê yekê me hemû astngî derbasdikirin. Zimanê Kurdî di dema desthilatdarîya rejîma BAAS de hatibû qedexe kirin. Gelê Rojavayê Kurdistanê nedikarîn bi çand û zimanê xwe biaxifin, an jî nûçeyekî û bernameyekê temaşe bikin. Bi destpêkirina Şoreşa



Cûdî Elî

Rojavayê Kurdistanê û avakirina, di Ronahî TV gelek bernameyên çand û hûnerî, sîyasî, nûçeyên rojane û di heman demê de bernameyên jin yên xweser hatin çêkirin û pêşkêşkirin. Xebatkarên jin yên Ronahî TV di gelek qadan de xwe rêxistin kirin û civak perwerdekirin. Ciwanên ku pêşengtiya şoreşê kirin di xebata Ronahî TV de bi çalak cihê xwe girtin; di heman dêmê de zimanê Erebî jî weşan tê kirin. 13'emîn salvegera avakirina Ronahî TV di serî de li Rêber Apo, di heman demê de hevalên ku li şer û bûyerên ku li Rojavayê Kurdistanê şahidî kirin û gehiştin asta şahadetê bibîrtînîn û soza bilindkirina kar û xebatên Ronahî TV û Ragihandina Azad didin."

### 'Ronahî TV dengê resen yê şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye'


Nûçegihan û xebatkara Ronahî TV Cûdî Elî jî, anî ser ziman ku ev demeke dirêje ku ew karê ragihandin û çapemeniya azad dimeşîne, rastiya xwe li Ronahî TV de ditîye û wisa dest bi axiftina xwe kir: "Min sala 2016'an dest bi xebatên ragihandinê di Ronahî TV de kir. Min ezmûnên xwe yên qada ragihandinê li Televizyona Ronahî girtin. Rastiya civakê bi riya Ronahî TV hate dayîn û naskirin û rastiya civaka Kurd û Rojhilata Navîn me wek xebatkarên Ronahî TV û Çapemeniya Azad hewil dan ku bi şêwazekê resen rastiyên heyî bighînin raya giştî. Em jî wek endamên ragihandinê erka me ya serekeye ew e, ku em civaka xwe li hemberî êrişên heyî biparêzin û perwerde bikin. Ji xwe Rêber Apo demekê pir dirêj li Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebat meşand û gel perwerde kir û kedeke wî ya bingehî di rêxistina civakê de heye. Wek Ronahî TV me jî hewil da bi fikir û paradîgmaya Rêber Apo ya 'Civaka Demokratîk, Ekolojîk û Azadiya Jin' kar û xebatên xwe bimeşînin. Ronahî TV ji bona hemû kar û xebatên di nava civakê de bi rêk û pêk û li gorî hişmendiya Rêber Apo bimeşin. Ji bona azadiya jin jî gelek ked ji milê Ronahî TV ve hat dayin. Her wiha di bingehê kar û xebata Ronahî TV de azadî û vîna jinê tê esas girtin û li hemberî hemû tûndiyên li hemberî wê riya têkoşînê tê xêzkirin. Wek jin û bi taybet jî jinên Kurd di hemû dezgeh û saziyên Ragihandinê de pêşengtiyê dikin. Di Televizyona Ronahî TV de jî, gelek xebatkarên jin cihê xwe digirin. Em careke din bi boneya salvegera Ronahî TV hevalên ku ji bona pêşxistina kar û xebatên ragihandinê cihê xwe girtin û canê xwe fedakirin bibîrtînin û hevalên ku heya niha jî xebatê didin meşandin pîroz dikin."

# Silêman Ehmed 393 rojin di girtîgeha PDK'ê de tê ragirtin

**Navenda Nûçeyan**

**Rojnamevan Silêman Ehmed 393 rojin ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin. Bi hincetên ji rastiyê dûr piştî 279 rojan hate dadgehkirin û PDK'ê 3 sal cezayê girtîgehê lê birî.**

Silêman Ehmed roja 25'ê Cotmeha 2023'yan dema xwest derbasî Başûrê Kurdistanê bibe bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin. Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê di daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast de got ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine.



Herî dawî di bin zextên sivîl yên rojnameger, sendîka û rêxistinên li ser asta herêmî û navnetewî de, roja 22'yê Gulanê destûr hat dayîn ku parêzerên wî li girtîgeha Asayîşa Dihokê hevdîtinê pê re bikin.

Yek ji parêzerên Silêman Ehmed, Beşdar Hesen di derbarê hevdîtina wê demê ya li gel Silêman de agahî dabû ajansa me û gotibû: "Em bi Silêman Ehmed re li odeyekê rûniştin. Di hevdîtinê de Silêman Ehmed spasiya hemû kesên ku ji bo wî hewl dane kir û silavek taybet ji hemû xebatkarên Ajansa Rojnewsê re şand. Her wiha Silêman Ehmed spasiya hemû rêxistin, sendîka, rojnamevan û welatparêzan kir ku hewl dane wî azad bikin. Em gelek keyfxweşin ku me rewşa tenduristiya wî baş dît, tenê daxwaza wî ew bû ku heta serbest bê berdan zextên heyî berdewam bike."

Herî dawî 3'yê Hezîranê Dadgeha Sûc ya Yek ya Duhokê roja yekê ya rûniştina dadgehê ya edîtorê beşa Erebî yê ajansa me Silêman Ehmed weke 30'ê Hezîrana îsal, diyar kir. Lê dadgehê bi hêceta dadwer ne amadeye û asayîşê kel û pelên rojnamevaniyê ne şandiye, danişîn ji bo 29'ê Tîrmehê hatibû taloqkirin. Di 29'ê Tîrmehê de Dadgeha Dihokê 3 sal cezayê girtîgehê li Silêman Ehmed birî.

Derbarê madeya ku Silêman Ehmed pê tê darizandin, parêzerê wî Beşdar Hesen wiha gotibû; "Ew madeya ku muwekîlê me Silêman Ehmed pê tê darizandin, madeya yek ya yasaya hejmar 21 ya sala 2003'yê ya Parlamentoya Herêma Kurdistanê ye ku taybete bi têkdana ewlekariya Herêma Kurdistanê."

Herî dawî Parêzerên Silêman biryar îtîraz kirin û dosyaya Silêman Ehmed radestî Dadgeha Temîzê kir. Parêzer Nerîman Ehmed got, dosya Silêman Ehmed li ber destê Dadgeha Temîzê ye û li bende ne ku biryara dawî li ser bide.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku ev ne cara yekê ku PDK'ê Rojnemevanên azad dirvîne, işkence dike û qetil dike, dîroka PDK'ê bi van kiryarên neexlaqî tijî ye.

# Rêyên çareseriyê

Hevserokê Partiya Kesk a Demokrat, Luqman Ehmê da zanîn ku mijara diyaloga bi hikumeta Şamê re têkoşîneke mezin jê re divê. Herwiha Ehmê diyar kir ku di Saykis Pîko de siyaseta Sûriyê û dewletên din hat bicihkirin, lewma jî biriyara guhertinê di destê Ferensa û Birîtaniyayê de ye.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Rojhilata Navîn, cîhan û Sûriyê rastî geşedanên siyasî û hwd… tên û derbasî qonaxên nû dibin. Rewşa siyasî li van herêman rojeveke girîng e ji bo hemû aliyên herêmî û cîhanî. Derbarê heman mijaran hevserokê Partiya Kesk a Demokrat, Luqman Ehmê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:



**Bi hilbijartinên Amerîka û serkeftina Tramp re, çi sînaroyên muhtemel ji bo herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rojhilata Navîn wê werin çêkirin?**

Li gorî şopandina rewşa hilbijartinan û xafaftinên wan di hilbijartinan de, wê Amerîka dûrî siyaseta xwe ya berê nekeve. Dema ku Tiramp li ser desthilatdariya Amerîkî bû, rewşa cîhanê û herêmê bi giştî ne weke ya roja îro bû. Mînak şerê di navbera Rûsya û Okraniyayê de tune bû. Herwiha şerê di navbera Israyîl û Hemasê de rûneda bû. Hem jî destekdayîn Îran ji Hizbullahê re bihêztir bû. Rewşa Cîhanê û herêma Rojhilata Navîn ya roja îro û dema serokatiya Tiramp a yekê ne heman tişt e, rewş hatiye guhertin. Wê rewşa siyasî û geşedanên ku îro li cîhanê tevî diqewimin, bandorê li siyaseta Tiramp bike. Gelek siyastemedar û kesayetên xwedî bandor li Amerîka helwest girtin



ji siyaseta Tiram a ku cara yekem da meşandin li Sûriyê, bi taybet ji mijara vekişîna hêzên amerîkî ji Serêkanî û Girê Spî. Em texmîn nakin ku Tiramp biryara vekişînê ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê bide û li wê siyaseta xwe vegere. Sedem ew e ku ji ber siyaseta xwe, ew di hilbijartinên sala 2020'an de bi ser neket û ji şaştiya xwe fêr bû. Li aliyekî din sedemên ku dihêlin Amerîka li Sûriyê û Rojhilata Navîn bimîne, hîna weke xwe ne û gele pirsgirêk hene çareser nebûne. Sedema yekem destekdayîna wê ji hêzên QSD'ê re ji bo şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê, ji xwe hîna xeteriya DAIŞ'ê li ser herêmê heye. Sedema duyem jî hebûna Îranê li Sûriyê û Rojhilata Navîn e, Amerîka vê yekê naxwaze. Lewma wê Emerîka li gorî siyaseta xwe ya berê bimeşe û eger Amerîka xwe vekişîne ji Sûriyê û Rojhilata Navîn wê kîjan alî cihê wê dagire? Tekez wê Rûsya û Îran cihê wê dagire, ne Tiramp bi tenê birayan dide, lê belê meclisa rûsipiyên wê û kongrêsa Amerîkî biryara mayîna hêzên amerîkî didin. Eger vekişîn jî çêbibe wê cengeke mezin li cîhanê çêbibe ji ber ku wê her aliyek hêza xwe bicerbîne. Encam jî wê Tiramp zehmetiyên mezin derxîne pêşiya siyaseta Amerîka.

**Di vê dema heyî de ya ku her aliyek berjewendiyên xwe dixwaze û gelên herêmê derbasî kaosên domdar dikin, Rêveberiya Xweser ji bo çarserkirina pirsgirêka Sûriyê û gelên wê, insiyatîf û diyalogê dide pêş, gelo çima ev yek ji hêla hemû hêzan ve tê paşguhkirin?**

Di destpêkê de pêwîste em bizanibin ku proje, armanc û berjewendiyên van hêzên ku li Sûriyê dimînin çi ne? Di serî de Rûsya armanca wê ew e ku hikumeta Şamê vegere weke berê. Li aliyekî din dewleta Tirk projeya wê di Sûriyê de pêkanîna Mîsaqa Millî ye, ew dibêje kirasê ku di Hevpeymana Lozanê de li min hatiye kirin, teng e, Erdogan dibêje êdî gereke sînorê Tirkiyê fereh bibe. Herwiha berjewendiya Îranê jî ew e ku di Sûriyê de lawaz û bêbandor nebe. Eger ku hikumet hilweşiya û guhertin çêbû ew namîne. Ev



hemû hêz naxwazin ku tu guhetin bikeve siyaseta hikumeta Şamê. Lê hêza navnetewî ya ku doza guhertina siyaseta hikumeta Şamê dike û zextê lê dike ku dewleteke demokrat ava bike, Amerîka ye. Amerîka jî ewqasî ji bo hikumeta Şamê ne xwedî bandoriyeke mezin e, hêzên xwedî bandor Îran û Rûsya ne, ew herdu dewlet jî vê yekê naxwazin. Ya girîngtir wekî em dizanin kubingehê siyaseta Sûriye ya niha, di encama hêzên navnetewî de bi civîna Saykis Piko di 1916'an de hate danîn. Ji wê demê heta îro tiştek di vê siyasetê de nehatiye guhertin. Ne tenê li Sûriyê ev siyaset wiha bû li hemû dewletên ku ketin bin sînorkirina biriyarên Saykis Bîko de. Îraq jî wiha bû, Sedam Husên di 2003'an de bêhêz mabû, berî ku êrişa Amerîka li ser Îraqê jî tevî ku ji hêza xwe ketibû, diyalog bi Başûrê Kurdistanê re ji bo pirsa kurdî nekir, ew şikest jî li sîstem neguhert. Em dizanin yên ku Saykis Pîko çêkirin, Ferensa û Berîtaniya ne, hîna jî ev dewlet hene û tiştek ji siyaseta wan nehatiye guhertin û bêyî ku herdu dewlet tiştekî nepejirînin, guhertin di siyaseta wan de çênabe. Li Sûriyê jî hetanî ku Ferensa û Berîtaniya li ser guhertina siyaseta hikumeta Şamê nebêjin (Erê) wê hikumet heman siyasetê bimeşîne.

**Hetanî guhertineke siyasî di Sûriyê de pêk were û pirsgirêka Sûriyê çareser bibe, pêwîste çi were kirin?**

Rêveberiya Xweser bi vîna gelan rabûye û hatiye damezrandin, gelên herêmê ew çêkiriye, ev gel demokrasiyê dixwaze. Wê demê jî Rêveberiya Xweser jî hertim demokrasî û diyalogê dixwaze. Lê hikumeta Sûriyê û şêwazê bidestxistina serweriyê ne bi rêbazekî demokratîk û hilbijartinê hatiye ser desthilatdariyê. Di sala 1963'an de rêjîma Beisê bi derbeyeke leşkerî desthilatdarî xist bin destê xwe. Piştî wê Hafiz Elesed bi Herke Elteshîhiye, ku bi rêbazê derbeya leşkerî bû serwer. Ev rêjîm tev, ne bi rengekî demokratîk hatine ser hukim û ne bi riya diyalogê gihane asta ku ew tê de, bi rengên cuda hatin. Eger bi rengê cuda gihaştin ser hukim, em ji wan re bibêjin bila diyalog çêbibe, wê ew têk biçe, ji ber ku ew siyasetekê dikin dûrî wê bingeha ku li ser hatine damezrandin e. Ji ber wê jî dûrketina hikumeta Şamê û reva wê ji diyalogê matmayî namînim. Lê dîsa mijara diyalogê têkoşîneke mezin jê re pêwîste. Di dema heyî de têkoşîneke siyasî û leşkerî heye. Di vê Rêveberiya Xweser di warê mijara diyalogê de hertim berdewam be. Herwiha divê danûstandin bi Ferensa û Berîtaniya re were kirin ji bo pêkanîna guhertina siyasî li Sûriyê. Ji ber ku biriya guhertina siyaseta rêjîma Sûriyê di destê wan herdu dewletan de ye.

## Nema tu kes dikare gelê kurd bixapîne



**Dilyar Cizîrî**

Ev demeke di cîhanê de şerekî mezin yê bi tirs tê meşandin. Hemû aliyên zirhêz cihê xwe di vî şerî de girtine. Balkêşe, hesabên her aliyekî ji yên din cûdatir e.
Di heman demê de wer xuya dike tirs û baldariyek mezin di navbera aliyan de heye. Bi êrişa Rûsiya li ser Ûkraniya beşek mezin ji riwê vî şerî zelal bû. Di şerê di navbera Îsraîl, Hemas û Huzib El-Ah de ev hîn zêdetir riwê aliyan diyartir kir. Di rewşeke wiha de dewleta Tirk û Erdogan dixwaze xwe bê alî nîşan bide. Heta niha jî di avakirina vê dengeyê de tu serketin bi dest nexistiye. Berûvajî wê dewleta Tirk a qirker û siyasetmedarên wê di nêrîn û raya xwe de bê istiqrariyê jiyan dikin. Rayedar û berpirsên Tirkiyê pêvajoya di asta cîhanê de tê meşandin, dişopînin û baş dizanin heger siyasetên xwe nedin guhertin wê di pêla guhertina heyî de gelek alîgir û hevkarên xwe winda bikin. Axaftinên hevkarên sereke yê Erdogan, Dewlet Baxçelî derbarê hatina Rêber Abdulah Ocalan a Perlamenta Tirkiyê, vê xalê nîşan dide. Di heman demê di nîqaş û nêrînên cuda cuda yên ketine rojava dewleta Tirk bi hemû aliyên wê de mijarê zelal dike. Di heman demê de xuyaye ku rayedarên dewleta Tirk ji ber kîn û nefreta xwe ya li dijî gelê kurd û doza wî nikarin wan rastiyan qebûl bikin. Erdogan û hevalbendên wî wiha hesab dikin ku dikarin bi hêsanî gelê kurd bi hinek daxuyanî yan bi silavekê bixapînin. Heger dewleta Tirk bi rastî dixwaze pirsgirêkê çareser bike, ji daxuyaniyan zêdetir gerek dawî li Tecrîda li Îmralî bîne. Rê ji Rêbertî re veke. Ev wê bibe gava rast a yekem li ser riya çareseriya demokratîk a ji bo tevahî Tirkiyê ye. Bela rayedarên Tirkiyê bizanin ewê nikaribin li doza kurd bizîvirin. Gava duyemîn jî bela êrişên xwe yên li dijî Başûrê Kurdistanê rawestîne. Di heman demê de dest bi vekişîna bargehên xwe yên dagirkeriyê ji wê derê. Êrişên li ser Rojavayê Kurdistanê jî beşekî mezin a siyaseta wan e. Ew jî di çarçoveya heman konsebtê de demeşe. Wekî gava sêyemîn jî êrişên xwe yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestîne. Wê caxê emê bêjin niyeta dewleta Tirk a çareseriyê heye. Ema bi vê rewşa heyî ku hîn tecrîda li Imralî bi hemû hêza xwe dimeşînin, êrişên xwe bê navber dewam dikin, wele bela qisûrê efû bikin tu pêvajo ne mumkine. Bela dewleta Tirk û hemû dijminên gelê kurd bizanin, di vê dema li Rojhilata Navîn bayê guhertinê rabûye, gelê kurd ji her kesî zêdetir ji guhertinê re amade ye. Pirojeya Rêber Apo ya Netewa Demokratîk çekê herî bi hêz a di destê gelê kurd de ye. Mînaka wê jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di meriyetê de ye. Di rewşa heyî de tenê yek xeta çareseriyê heye, ew jî di yek riyê re derbas dibe, ew jî Îmralî ye. Îcar bela dewleta Tirk û rayedarên wê wiha fêm nekin ku ew ê jî wekî bapîrên xwe gelê kurd bi hinek soz û daxuyaniyan bixapîn in.



# 'Bi kongreyekê, binesaziyek siyasî ji bo siberoja Sûriyê ava bû'

Fewzî Şingalî da zanîn ku Kongreya Rêya Demokratîk a Sûrî di encama civînên Stokholmê de, weke gewdeyekî siyasî bi armanca çareserkirina kirîza Sûriyê ava bû û got, Ji vê kongreyê, desteyek bi 21 kesayetên Sûrî ji bo meşandina xebata diplomasî-navnetewî, hat çêkirin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Kongreya Riya Demkratîk a Sûrî di 25 û 26'ê Cotmehê de li paytexta Belçîkayê Brukselê hat lidarxistin. Herwiha 128 kes ji hundir û derveyî Sûriyeyê tevlî vê kongreyê bûn, ji wan kesên ku amade bûn, gelek siyasetmedar ji hemû pêkhateyên Sûriyê û kesên biyanî bûn. Têkildarî lidarxistina Kongireya Riya Demokratîk a Sûrî, sekretêrê Partiya Rêkeftina Demokratik a Kurd li Sûriyê, Fewzî Şingalî ji rojnameya me re axivî.



**'Kongre ji encama civînên Stokholim hat lidarxistin'**

Fewzî Şingalî diyar kir ku Kongreya Riya Demokratîk a Sûriyê di encama çar civînên Stokholmê de hat lidarxistin û wiha got: "Ji sala 2020'an ve Civînên Stokholmê li dar diketin, mijara sereke ya ku dihat guftûgokirin di wan civînan de ew bû ku çawa kirîza Sûriyê çareser bikin. Herwiha hemû aliyên di civînan de li ser bingeha ku çi bikin ji bo çareserkirina pirsgirêka Sûriyê, kom dibûn. Di her çar civînan de amade dibûn, nûnertiya gelên Sûriyê, hemû ol, rêxistin û partiyên siyasî dikirin. Em jî weke partiyeke kurdî bi navê Partiya Rêkeftina Demukratîk a Kurd li Sûriyê tevlî kongreyê bûn. Di civîna çaremîn de ku di sala 2023'an de hat çêkirin, biriyara lidarxistina kongreyekê hat girtin. Bêtirî 100 kesî tevlî kongeyê bûn, herwiha gelek kesên din bi riya zomê beşdar bûn. Di nav van delegeyan de kurd, ereb, suryan, aşûr, turkmen, durzî, elewî û hwd… hebûn."

**'Pêwîstî bi binesaziyeke siyasî ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê hebû'**

Fewzî destnîşan kir ku pêdivî bi rêxistin û binesaziyek ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê hebû wiha axivî: "Me li gel Rêveberiya Xweser û MSD xwest gewdeyekî siyasî demokratî-Sûrî kongreyekê weke riyeke çareseriyê ji bo bidawîkirina kirîza Sûriyê li dar bixin. Di kongreyê de belgename hat îmzekirin, vê kongreyê li ser gelek xalên girîng tekez kir. Yek ji wan xalan ew e ku hemû pêkhateyên Sûriyê nasnameya sûrî bingeh digirin, lê her pêkhateyek nûnertiya xwe dike û garantiya mafê xwe ji hemû aliyan ve dike. Gelê kurd jî pêkhateyek bingehîn e di Sûriyê de, li gorî belgeyên dîrok pêwîste kurd mafê xwe bi dest bixin. Li aliyekî din çareseriya kirîza Sûriyê li gorî pîvana navnetewî ya 2254'an e. Di heman demê de çareseriya siyasî li Sûriyê pêk were, şer û pevçûn raweste, Sûreyeke nenavendî_demokratîk_pirrnetewî were avakirin. Kongreya Riya Demokratîk a Sûrî, serweriya Sûriyê tiştekî sereke dibîne, pêdiviya bi guhertina destûra Sûriyê heye, hem jî divê navê Komara Erebî ya Sûrî were guhertin bi Sûriyeke demokratîk. Hem jî ev kongr destnîşan dike ku hemû rengên dagirkeriyê û destwerdanên derveyî bên bidawîkirin. Li şûna wê jî diyaloga sûrî_sûrî li pêş bikeve û gelên Sûriyê pêşeroja xwe diyar bikin."

**'Bi 21 kesan, ji bo xebata diplomasî desteyek ava bû'**


Şingalî eşkere kir ku bi armanca bicihkirina belgenameya çareserkirina kirîza Sûriyê û pêkanîna xebata diplomasî desteyek hat avakirin û wiha doman: "Kongreya Riya Demokratîk a Sûrî guhertinek ji warê nîqaş û guftûgoyê ber bi pêngava xebata rêxistinî û piratîkî ve, di warê diplomasî de bû. Di encama vê kongreyê de Desteya Berpirsiyariyê bi 21 kesan hate avakirin, ev deste ji hemû pêkhate û aliyên siyasî ava bû. Bê şert û merc kes bi rengekî hatin hilbijartin endamên desteyê hatin hilbijartin û di nav xwe de desteya rêvever damezirand. Ew deste li Rojava, Sûriyê, Amerîka û hemû dewletên Ewripayê heye. Ji ber vê jî di nav geşedanên siyasî yên herêmê û cîhanê de wê ev deste tevlî xebata siyasî bibe. Helbet wê xebat ji bo pêkanîna belgenameya ku di kongreyê de hate li ser tekezkirin be. Xebata diplomasî wê bi riya ofîsên kongreyê were kirin, wê ev ofîs li hundirê Sûriyê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê, welatên Ewripayê di siberojê de vebin."

**'Aliyên navnetewî kongre û civînên Stokholmê dişopandin'**

Piştî zêdeyî 12 salan ji destpêkirina aloziya Sûriyê û lidarxistina civînên me yên Stokholmê, hewcedarî bi binesaziyeke siyasî li ser ruyê erdê hebû. Ji ber ku di dema heyî de piştî evqas sal, ne hikumeta Şamê û ne jî hêzên ku navê muxalefetê li xwe dikin, nekarîn kirîza Sûriyê çareser bikin. Ji ber ku her hikumeta Şamê, ne xwedî biryar e û hêzên navê muxalefetê li xwe dikin, di destê Tirkiye û dewletên Kendava Erebî de ne. Ji ber wê jî ev çar sal in ku em ji bo xebata hevbeş ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê hevdîtinan dikin. Civînên Stokholmê tev bi riya Navenda Olifbalimê bi rê ve diçûn. Herwiha Meclisa Rûrsipiyên Amerîkayê, ferensî, emrîkî, belcîkî û hwd… weke şopîner û guhdar tevlî civînan dibûn. Navenda Olfbalimê bi riya onlinê re di kongreyê de amade bû û pîrozbahî kir ji bo lidarxisitina kongreyê. Em dibînin ku ev aliyên navneteweyî yên civînên Stokholmê dişopandin, wê bibin şopdarên encamên Kongreya Demokratîk.

## Ji bo komkujiya Kurdan wê ji Trump destûr bigirin an na?

**Zekî Bedran**



Çapemeniya Erdogan ji bo holêrakirina Rojava û dawî anîna Rêveberîya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Surî nîqaşeke kûr daye destpêkirin. TRT'ê û çapemeniya alîgir a dewletê hemû di bin fermana Erdogan de ye. Ev amûrên ku ji milê baca gel ve aborîyê we tê rêvebirin, bi tevahî di rewşa bikaranîna şerê taybet de ne. Êrîşên ku hê li bejahî, hewayî û di qadê de destpê nekirine bi destê çapemeniyê ve hatine destpê kirin. Kesên ku wek amûrên şerê taybet bikar tînin di bin navên Profesor, Doçent, bijîşk, pispor û hwd. ve derdixin li hemberî gel. Di salên 1990'î de generalên teqawît bûne, çapemenî dagir dikirin, qada nîqaşê jehrî dikirin, gotin di cih de be hişmendîya gel radest digirin. Ya ku Erdogan niha dike jî, ji bo berê rihmetê dide xwendinê.

Piştî ku Trump hate hilbijartin ji bo êrîşên komkujiyê Erdogan îştahekî zêdetir ve diaxive. Berê bi hevkirina Trump re qada hewayî dabû vekirinê û bi vê avayê Grê Spî û Serêkaniyê dagir kirîbû. Vê carê piştî ku Trump hat hê peyama xwe ya yekem de li ser Rojava û YPG'ê dest bazariyê kir. Tirkiye qaşo ji bo sînorên xwe biparêze artêşa xwe xistiye Sûrî. Erîş, dagirkerî û baregehên ku li Iraqê avakiriye jî em datînin aliyekî. Li hember Tirkiyê hêza Kurda û Rojava ya ji bo buyna gef nîne. Hêz û parastina hewayî û artêşa kurdan nîne. Ger ku hebûya Tirkiyê wisa her rojê nikarîbû gef ji kurdan bixwe û balafiran ve her roj êrîşên qadên jiyanî bike. Dîsa tu demê erîşeke Kurdan li ser sînorên Tirkiyê çênebûye. Gundekî wan yê hatiye dagirkirin nîne. Kurdan ji Tirkiyê re şer jî îlan nekirine. Şerê yek alî yê Tirkiyê ya tunekirinê û çokdanînê heye. Erdogan bi pesindayinê ve dibêje me sînor aniye di asta çûk nefire. Sînorên Sûrî de serî heta binî bi dîwaran ve hatiye girtin, bi teknîkeke pêşketî ve her cih bi şev roj tê çavdêr kirin. Di cîhanê de sînorên ku herî zêde li ser însan têne kuştin sînorê Tirkiyê ye. Tirkiye ji bo 'sînor û ewlehiyê' Sûrî dagir kirî ye, axa Kurdan aniye asteke nejîyankirinê.
Niha li Efrînê û qadên dagirkirî yên din de PKK an jî YPG nîne. Wê demê çima Kurd nikarin vegerin li ser axa xwe? Mekanên dîrokî ên Kurdan li wan tên paqijkirin. Li ber çavên cîhanê paqijiya etnîkî tê kirin. Sedhezaran însanên din çima li van herêman tên bi cîh kirin? Ev tiştên ku Tirkiye dike dide xuya kirin ku ne ji ber pirsgirêka wan ya ji PKK'ê û YPG'ê re ye. Pirsgirêka wan yên bingehîn gelê Kurd e. Kurdên ku mafê xwe digerin, li wê hemberî polîtîkaya bişaftinê disekinin yên wan kiryaran na pejirînin ji bo wan dijmin in. Ev rastiyeke pir vekirî û bê nîqaş e. Ger ku wisa nebûya guhertina demografik pêknedianîn. Heremên ku wek Efrînê ên ku bin Rêveberîya Xweser de dihat rêvebirin, zimanê perwerdê Kurdî bû. Karê dagirkera yê yekem qedexekirina perwerdeya Kurdî bû.
Nîqaşên ku çapemeniya Tirkiyê de tên meşandin bê sînor didomin. Ji bo Kurdan ti mafekî jîyanî û pîvan nayê berçav kirin. Kiryarên ku li ser axa Sûrî dimeşînin, weke ku welatek cûda nîne, nav sînorên Tirkîyê ne ji rêzê nêz dibin. Komkujî û qirkirina gelan wek mafên xwe dibînin. Gel jî dikin parçeyekî sûcên xwe. Pirsgirêka Kurd ji bo Erdogan buye mijareke lîstokên deshilatdariyê û bêbandorkirina mûxalefetê.
Wisa tê fêmkirin ku hevdîtinên di Astanayê de Rusyayê sefereke din ya Tirkiyê ji bo li ser Sûrî ne pejirandiy ê. Derfetên me yê agahî di nava çavkaniyek xwe cihî bigirin nîne lê rojevên ku diteyîsin çapemeniyê de wisa tê xuyakirin. Nûnerê Taybet ê Pûtîn yê li Sûriyê Aleksandr Lavrentyev dibêje ''Em li dijî planên dagirkeriyê ên Tirkiyê ne. Evê heremê zêdetir neyînî bandor bike.'' Rewşa heyî de Rêvebirî û çapemeniya Tirk zêde vê nîqaş nake. Ew ketine hîn xeyalên din. ''Hin wezîrên ku Trump hilbijartiye piştgirîyê didin Kurdan û YPG'ê!..''
Lê belê yên ku nîqaşan de nîyetên xwe yên cevherî derdixin holê jî hene. Dibêjin ''Li Sûriyê de Kurd ji bo me tenê pirsgirêka ewlehiyê nînin. Xeterîyeke zêdetir ya stratejîk heye.'' Dibêjin 'Ev xeterî di asta demdirêj de ji bo Yek Milet, Yek Dewlet, Yek Ziman û hwd heye.' Ango Kurd derveyê sînorên Tirkan jî eger hebin û bi nasnameya xwe ve jiyan bikin ev ji bo Tirkiyê xeter e. Wisa difikirin ku wê demê bişaftina Kurdên di nava Tirkiyê de dê zihmettir bibe. Li holê ye ku ev şêwaz fikirandin di nava xwe de raste rast komkujiya kurdan dihewî ne. Ji ber vê yekê divê mirovên rewşenbîr û demokrat van nîqaşan li gor vê binirxînin û li hember komkujiyê divê çi were kirin pêşîya wê bigrin û helwest raber bikin.

## 2 meşên dîrokî…



**Farûk Sakik**

Dawiya hefteyê, 2 meş û mitîngên dîrokî pêk hatin. 16'ê Mijdarê li Ewrupa li bajarê Almanyayê li Kolnê û ya duyem jî 17'ê Mijdarê li Batmanê pêk hat. Herdû mitîng jî bi heybet bûn.
Heger dewleta Alman û Tirkiyê êrişkar nebûna û piçek jî li gor çanda demokrasiyê û mafê mirovan tevbigeriyana, wê ev hijmar 2-3 qat zêde bûna. Lê em dîsa jî bi dû reqeman nekevin. Hejmarek ku ji wan re bibe bersiv li herdû qada hebûn. Dema pêngava 10'ê Cotmeha 2023'yan dest pê kir, şiyarek wan hebû. 'Ji Rêber Apo re azadî û pirsg Kurd re çareseriya siyasî'.
Di mitînga Kolnê de me nedît dirûşma ji Kurdistan re statu derket pêş. Me nebihîst ku dirûşma "Bijî Kurdistan" berz bibe. Civaka Kurd êdî polîtîze bûye. Ev civak azadiya Kurdistan di azadbûna Rêber Apo de dibîne. Dizanin ku dema Rêber Apo azad bibe ev doza Kurdistan bi awayekî siyasî wê çareser bibe. Li Batmanê di mitînga dîrokî de, jî gelek peyam hatin dayin. Di hemû axaftin û peyaman de behsa vekirina deriyên Îmraliyê û mixatabê çareseriyê Ocalan e, dihat kirin. Di nav girseya hatibû qadê de dirûşmên "Bijî Serok Apo" bilind dibûn. Di mitîngê de mijara qeyûm zêde derneket pêş. Li vê derê jî rastiyek derdiket holê ku mijara qeyûm bi tenê bi azadkirina Rêber Apo tê çareserkirin. Divê ku dewleta Tirk van peyamên li qada Batmanê hatin dayin baş şîrove bike û li gor wê gav bavêje. Û dibe ber bi adresa gel nîşandayî bi rê keve. Ango ber bi Îmraliyê. Li Îmraliyê di dest Rêber Apo de, nexşereyek ne tenê çareseriya doza Kurdistan, hemû pirsgirêkên Tirkiyê û Rojhilata-Navîn çareser bike, heye. Di hevdîtina xwe ya dawî de jî gotibû; "ez xwedî hêzek çareseriyê me". Dewletê jî ev yek dîtibû ku Bahçelî di nîqaşên çareseriyê de navê wî dianî ziman. Dibe ku li du hin lîstika bin. Lê dîsa jî dizanin, Rêber Apo di demekî kurt de van lîstikê wan wê bibîne.
Tirkiye jî wa îtiraf dike ku êdî têk çûne. Şerê Cîhanê tê Sêyem de, şer nêzî sînorên Tirkiyê dibe. Di serdemek wiha de, ji bo Kurdan tiştên erênî tên bikaranîn. Divê nêzikatiya Tirkiyê nêzikatiya çareseriyê be. Dewleta Alman jî divê ji nû de hin biryaran bide. Rastiyan bibîne û lîsteyên xwe yên rêxistinên qedexekirî ji nû de di ber çavan re derbas bike. Divê dev ji wê siyaseta xwe ya qedexekirina al û sembolên Kurdan berde. Wan jî dît ku li kolanên Kolnê li hember ewqas qedexekirin israrek kurdan a çawa hebû. Kurdên li Ewrûpayê, ji ber sedemên şer ji ber zilma dewletên dagirker xwe spartin dewletên Ewrûpa. Kurdên ku derbasî Ewrûpa bûn ji bo ku di nav çerxên vê sîstemê de nehelin ji aliyê PKK'ê ve hatin birêxistin kirin. Hemû sazî û dezgehên li Ewrupa, li ser vê bingehê hatin avakirin. Li van navenda Kurdan têkoşîna xwe ya doza Kurdistan pêk anîn. Li van navendan ji bo rojek vegerin ser axa xwe hêviyên xwe mezinkirin. Li van navendan hêviya herî mezin xelasiya herî mezin di PKK'ê de dîtin. Li dora vê tevgerê civiyan. Dema, dewletên we bi komployek Rêber Apo radestê dewleta Tierkiyê kirin, ji bo wan jî serdemek nû ya têkoşînê destpê kir. Têkoşîna azadiya Rêber Apo.
Ev mitîng û meşa Kolnê jî li ser vê bingehê hat liddarxistin. Li vê qadê bibîra we xistin ku şert û mercên we çibin, me bi yek tiştî bawerî heye ew jî 'azadiya Rêber Apo' ye.